EUROPEAN UNION AGENCY FOR ASYLUM

# ŞOPANDINA MALBATÊ (MEZIN)

# FORM

Destnivîs di sala 2025-an de hatiye temamkirin
Ne Ajansa Yekîtiya Ewropayê ji bo Penaberiyê (EUAA) ne jî kesekî ku li ser navê EUAA-yê tevdigere, ji bikaranîna agahiyên di vê weşanê de berpirsiyar nîne.
Lûksembûrg: Ofîsa Weşanan a Yekîtiya Ewropayê, 2025

PDF ISBN 978-92-9410-790-9 doi:10.2847/9517251 BZ-01-25-034-EN-N

© Ajansa Yekîtiya Ewropayê ji bo Penaberiyê (EUAA), 2025
Heke çavkanî were nîşandan, nûberhemanîn destûrdayî ye.

| | |
|---|---|
| **Navê welatê +EU** | |
| **Navnîşana rayedarê neteweyî** | |
| **Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser çawaniya şandinê û cihê şandina vê formê** | *Ev der ji bo welatên +EU cihê vala ye ku rêbazên têkildarî şandina vê formê têxin nav de.* *Divê ev form çawa were şandin? Ji bo kîjan navnîşanê? Heya kengî?* |

# FORMA ŞOPANDINA MALBATÊ (MEZIN)

## ÇIMA EV FORM JI MIN RE HATIYE DAYÎN?

Rayedarên li vê welatî ev form ([1]) dane te, ji ber ku te serlêdana parastina navdewletî kiriye û te diyar kiriye ku endamekî malbata te li Welatekî Endam ê Yekîtiya Ewropayê an welatekî hevkar (wekî welatên +EU têne binavkirin) heye.

| |
|---|
| Welatên Endamên Yekîtiya Ewropayê ev in: Belçîka, Bulgaristan, Çekya, Danîmarka, Almanya, Estonya, Îrlanda, Yewnanistan, Îspanya, Fransa, Xirwatistan, Îtalya, Qibris, Letonya, Lîtvanya, Lûksembûrg, Macaristan, Malta, Holanda, Awistirya, Polonya, Portûgal, Romanya, Slovenya, Slovakya, Fînlenda û Swêd. Çar welatên hevkar Îzlenda, Liechtenstein, Norwêc û Swîsre ne. |

Agahiyên ku tu di vê formê de didî, dê alîkariya rayedarên vî welatî bikin ku endamên malbata te bibînin, girîngiyê bidin doza te û welatê +EU yê ku divê serlêdana te lêkolîn bike diyar bikin. Ji ber ku endamên malbata te li welatekî din ê +EU ne, dibe ku ew welatê ku endamê malbata te lê ye, ji lêkolîna serlêdana te berpirsiyar be.

**Girîng.** Heke ji bo dagirtina vê formê tu hewceyî alîkariyê bî, rayedaran agahdar bike.

## ÇIMA JI MIN HATIYE XWESTIN KU EZ VÊ FORMÊ DAGIRIM?

Pêdivî ye ku rayedarên vî welatî bizanin ka endamên malbata te li yek ji welatên EU+ hene an na. Heke hebin, dibe ku welatê ku ew lê dijîn ji birêvebirina serlêdana te berpirsiyar be.

Her wiha rayedarên vî welatî dixwazin alîkariya te bikin ku tu bi endamên malbata xwe re li welatên +EU bibî yek, heke tu bixwazî bi wan re bî. Heke tu dixwazî bi endamê malbata xwe re bibî yek, me agahdar bike û em ê lêkolîn bikin ka ev mimkun e an na û em ê hewl bidin ku vê yekê pêk bînin. Heke tu naxwazî bibî yek, di zûtirîn dem de ji me re bêje.

### Ez dikarim bi kê re bibim yek?

Tu dikarî bi endamekî malbatê re yê ku berê li welatekî +EU rûniştiye bibî yek. Ev kes ev in:

- hevjîna te (jin an mêr) – ji vê kesê re hevjîn tê gotin;

([1]) PDF: BZ-01-25-006-EN-N û Çap BZ-01-25-006-EN-C.

- partnerê/a te yê/a ne zewicî di têkiliyeke domdar de ([2]);
- zarokê te yê binî 18 saliyê re ([3]).

Her wiha tu dikarî bi kesekî re bibî yek ê ku hewceyî lênihêrîna te ye, an kesekî ku tu ji bo lênihêrînê pê ve girêdayî yî ji ber van sedeman:

- dugyanî (hemîlbûn);
- hebûna zarokekî nûbûyî;
- nexweşiya derûnî ya giran;
- nexweşiya fîzîkî ya giran;
- kêmasiya giran a laşî (astengdarî);
- trawmaya psîkolojîk a giran;
- temenê mezin (pîrbûn).

Ev kes dikare bibe:

- zarokê te (biçûk an mezin);
- xwişk an birayê te;
- dayîk an bavê te.

**Heke endamekî malbata te li welatekî +EU hebe, van mafên te yên jêrîn hene.**

- Tu dikarî daxwaza agahiyê ji kes û saziyên ku dikarin di dagirtina vê formê de alîkariya te bikin bikî.
- Tu dikarî daxwaza agahiyê li ser rêxistinên neteweyî, navdewletî û rêxistinên din ên têkildar bikî yên ku dikarin tespîtkirin û şopandina endamên malbata te hêsan bikin.
- Hevpeyvînek dikare bê organîzekirin da ku welatê +EU yê berpirsiyar ji bo lêkolîna serlêdana te ya parastina navdewletî were diyarkirin, heya ku hincetên betalkirina hevpeyvînê nebin.
- Tu dikarî her agahiyeke ku dikare alîkariya tespîtkirina hebûna endamên malbatê bike, bi devkî an bi belgeyan pêşkêş bikî.
- Tu dikarî li ser doza xwe daxwaza bêtir agahiyê bikî.

## DIVÊ EZ ÇI TÊXIM NAV VÊ FORMÊ?

**Ji bo ku rayedarên vî welatî alîkariya te bikin ku tu bi endamên malbata xwe re bibî yek, divê tu bi qasî ku pêkan e bêtir agahiyê li ser wan bi me re parve bikî.** Ev yek agahiyên bingehîn ên li ser endamê malbata te an kesekî ku tu pêwendiya girêdayîbûnê pê re parve dikî li welatekî +EU dihewîne, wekî:

- hûrguliyên wan ên kesane;
- cihê ku niha lê dijîn;
- agahiyên wan ên têkiliyê (kontak);
- agahiyên li ser statuya wan a qanûnî li wî welatî (heke statuya wan a wekî penaxwaz hebe, destûra rûniştinê hebe an li ser bingeha statuya parastina navdewletî ya berê hemwelatiyê wî welatî bin);
- her belge an delîlên ku têkiliyê îsbat dikin.

([2]) Heke qanûn an sepana welatê +EU, li gorî qanûnên xwe yên têkildarî hemwelatiyên welatên sêyem, bi cotên ne zewicî re mîna cotên zewicî tevbigere.

([3]) Ev yek behsa zarokê te yê biyolojîk an ê pejirandî (manewî) dike.

## Çima ev agahî girîng in?

Tu çiqas bêtir agahî bidî, ji bo rayedarên vî welatî ewqas hêsantir e ku bi rayedarên welatê ku endamê malbata te lê ye re têkilî deynin, têkiliya we piştrast bikin û di zûtirîn dem de we bînin cem hev.

Dibe ku tu ji bo hevpeyvînekê re bêyî vexwendin an jî pirsên din ji te werin pirsîn da ku bêtir li ser têkiliyê û cihê wî kesî agahî werin girtin.

Xem neke heke hemû agahî li cem te nebin. Çiqas ku tu dikarî dagire û rayedarên vî welatî dê herî baş bikin da ku pêvajoyê bidin destpêkirin. Heke belgeyên te hebin, di zûtirîn dem de ji rayedarên vî welatî re bişîne.

## DAGIRTINA VÊ FORMÊ ÇAWA DIBE?

**Gava 1.** Beşa 1-ê ya formê dagire. Ev beş agahiyên te yên kesane kom dike.

**Gava 2.** Ji bo her endamekî malbatê, beşên formê yên têkildarî endamê/ên malbata xwe dagire.
- Hevjîn an partnerê/a ne zewicî (Beşa 2).
- Zarokê/a piçûk (Beşa 3).
  *Heke gelek zarokên te li welatên +EU hebin, vê beşa formê ji bo her zarokekî dagire.*
- Kesê girêdayî (Beşa 4).
  *Vê beşê dagire heke:*
  - zarokê te (yê mezin), xwişk/birayê te an dê/bavê te hewceyî lênihêrîna te bin ji ber ku di rewşeke bêparastin de ne;
  - tu di rewşeke bêparastin de bî û hewceyî lênihêrîna zarokê xwe (yê mezin), xwişk/birayê xwe an dê/bavê xwe bî.

**Gava 3.** Dara malbata xwe xêz bike (Beşa 5) da ku hemû endamên malbatê nîşan bidî. Ev dikare ji bo hewildanên şopandina malbatê ya di pêşerojê de an ji bo fêmkirina ka kesên din hene ku yekbûna malbatê pê re were destpêkirin, bikêr be.

## KÎ DIKARE DI DAGIRTINA FORMÊ DE ALÎKARIYA MIN BIKE?

Heke ji bo dagirtina vê formê tu hewceyî her cure piştgiriyê bî, di nav de alîkariya qanûnî, tu dikarî daxwaz bikî. Heke tu tiştekî fêm nekî, tu dikarî ji rayedarên vî welatî alîkariyê bixwazî. Tu dikarî bêtir agahî li ser koma şêwirmendên qanûnî di belavoka agahdarkirinê ya derbarê prosedura diyarkirina berpirsiyariyê de bibînî. Tu dikarî ji bo dagirtina formê daxwaza alîkariya zimanî jî bikî.

*Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser KES û SAZIYÊN ku di temamkirina şablonê de alîkariyê didin û ŞÊWIRMENDIYA QANÛNÎ.*

## EZ DIKARIM ÇAWA BI ENDAMÊ MALBATA XWE RE BIBIM YEK?

- Pêşî, rayedarên vî welatî dê agahiyên ku tu didî binirxînin. Dibe ku ew te ji bo hevpeyvîneke din vexwînin.

- Heke mimkun be, rayedarên vî welatî dê daxwazekê ji welatê +EU yê ku endamê malbata te lê rûniştiye re bişînin.

**Girîng**. Divê hem tu û hem jî endamê malbata te ji bo yekbûnê razî bin. Heke yek ji we bibêje na, rayedarên vî welatî dê pêvajoyê berdewam nekin. Heke tu razî bî, dê ji te were xwestin ku tu razîbûna xwe ya nivîskî ya fermî ji bo yekbûnê bidî. Divê tu razîbûna xwe di formeke cuda de bişînî.

- Welatê ku endamê malbata te lê rûniştiye dê daxwazê binirxîne û belgeyan kontrol bike.
- Heke ew qebûl bikin, rayedarên vî welatî dê te veguhêzin wî welatî da ku tu bi endamê malbata xwe re bibî yek.

Rayedarên vî welatî bêyî daxwaza te, te bi kesekî re nakin yek. Razîbûn tê wê wateyê ku hûn her du jî razî ne ku serlêdana we ya parastina navdewletî li wî welatî were lêkolîn kirin ku endamê malbata we an kesê girêdayî we lê rûniştiye. Heke tu an endamê malbata te razî nebin, rayedarên vî welatî dê prosedura yekbûna malbatê dest pê nekin. Tu dikarî berî ku biryara veguhastinê were girtin, her dem razîbûna xwe vekişînî.

Li her du welatan jî, dozên yekbûna malbatê bi pêşengî (priorîtê) têne dîtin. Ev tê wê wateyê ku heke di doza te de yekbûna malbatê were destpêkirin, rayedar dê di zûtirîn dem de wê bişopînin.

## Tiştên ku divê tu zanibî

- Tu dikarî ramana xwe biguherînî û her dem berî biryara veguhastinê razîbûna xwe vekişînî.
- Ji bo ku tu bi endamên malbata xwe re bibî yek, ne hewce ye ku tu pereyan bidî kesekî – rayedar dê lêçûnan bigirin ser xwe.
- Dozên yekbûna malbatê wekî pêşeng têne dîtin, lewma rayedar dê doza te bi lez û bez bişopînin.

## Yekbûn tê çi wateyê

- Serlêdana te ya ji bo parastina navdewletî dê li welatê ku endamê malbata te bi qanûnî lê rûniştiye ([4]) were lêkolîn kirin.

Yekbûn nayê wê wateyê ku tu yê li wî welatî destûra rûniştinê bistînî.

## EZ NIZANIM ENDAMÊ MALBATA MIN LI KU YE. HÛN DIKARIN ALÎKARIYA MIN BIKIN?

Heke tu zanibî ku endamê malbata te li welatekî +EU ye lê tu ne ewle bî ka li ku ne, tu dikarî daxwaza piştgiriyê ji rêxistinên şopandina malbatê bikî yên ku dikarin alîkariya te bikin ku tu endamê malbata xwe bibînî. Heke tu hewceyî piştgiriyeke wiha bî, ji rayedarên vî welatî re bêje.

*Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser rêxistinên şopandina malbatê.*

([4]) Rûniştina qanûnî tê wê wateyê ku ew şert û mercên ketinê, manê an rûniştina li welatekî pêk tînin.

## AGAHIYÊN KU EZ DIDIM DÊ ÇAWA WERIN PARASTIN?

Agahiyên ku tu didî dê bi nepenî werin girtin. Ew ê tu carî bi welatekî ku di lîsteya welatên +EU de nîne (li rûpela 1-ê ya vê formê binihêre) an bi welatê we yê jêderk an welatê rûniştina berê ya te an endamê malbata te re neyên parvekirin. Agahî dê bi awayekî ewle ji welatê +EU re were şandin ku endamê malbata te lê ye, da ku rayedarên wî welatî karibin diyar bikin ka têkiliya we ji bo yekbûna malbatê guncan e an na. Heke hewce bike, dibe ku ji bo pirsên din, rayedar an rêxistin bi endamê malbata te re têkilî deynin.

## BEŞA 1. AGAHIYÊN KESANE YÊN SERLÊDER

| | |
|---|---|
| **Hejmara dozê:** | |
| Nav | |
| Paşnav | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |
| ☐ **Ez piştrast dikim ku endamekî malbata min heye ku li welatekî +EU rûniştiye.** | |
| Endamê malbata min ev e (zêdetirî vebijarkek dikare bibe hilbijartin) | ☐ hevjîn an partnerê min ê ne zewicî (Beşa 2)<br>☐ zarokê piçûk (Beşa 3)<br>☐ kesê ku girêdayî alîkariya min e an ez girêdayî alîkariya wî kesî me (Beşa 4) |
| Agahiyên din ên têkildar | |
| **Dîrok û îmzeya serlêder** | |

## BEŞA 2. AGAHIYÊN KESANE YÊN HEVJÎN AN PARTNERÊ/A NE ZEWICÎ

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Cihê zewacê an cihê ku têkilî lê pêk hatiye | |
| Dîroka zewacê an destpêkirina têkiliyê | |
| Cureyê zewacê an hevalbendiyê (zêdetirî vebijarkek dikare bibe hilbijartin) | ☐ merasîma dînî<br>☐ qeyda sivîl<br>☐ hevalbendiya sivîl a qeydkirî<br>☐ yên din (ji kerema xwe diyar bike): |
| Cihê niha an cihê herî dawî yê tê zanîn li welatên +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?

☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.

**Di vê rewşê de, dê ji te û endamê malbata te were xwestin ku hûn razîbûna xwe ya fermî bi nivîskî bidin. Razîbûna fermî dê di formeke cuda de bê xwestin.**

☐ Na, ez naxwazim bibim yek.

Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin.

| **Agahiyên têkildar li ser lawaziyên gengaz an sedemên mirovî** |
| --- |
| Tu dikarî li vir her agahiyeke têkildar a ku ji bo rayedaran girîng e derbarê endamê malbata te de (her lawazî, hewcedariyên taybet an sedemên mirovî) binivîsî. |
| **Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?** |
| |
| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye? *Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.** Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

## BEŞA 3. AGAHIYÊN KESANE YÊN ZAROKÊ/A PIÇÛK

*Heke gelek zarokên te li welatên +EU hebin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.*

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Cihê niha an cihê herî dawî yê tê zanîn li welatên +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |
| **Agahiyên têkiliyê yên wasî (parêzger), heke hebin** | |
| Nav | |
| Paşnav | |
| Hejmara telefonê | |
| Navnîşana e-peyamberê | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?

☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.

**Di vê rewşê de, dê ji te û endamê malbata te were xwestin ku hûn razîbûna xwe ya fermî bi nivîskî bidin. Razîbûna fermî dê di formeke cuda de bê xwestin.**

☐ Na, ez naxwazim bibim yek.

Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin.

| |
|---|
| **Agahiyên têkildar li ser lawaziyên gengaz an sedemên mirovî** |
| Tu dikarî li vir her agahiyeke têkildar a ku ji bo rayedaran girîng e derbarê endamê malbata te de (her lawazî, hewcedariyên taybet an sedemên mirovî) binivîsî. |
| **Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?** |
| |
| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye?** ***Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.** Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

| BEŞA 4. AGAHIYÊN KESANE YÊN TÊKILDARÎ KESÊ GIRÊDAYÎ | |
|---|---|
| *Heke bêtirî zarokek, xwişk/birayek an dê/bavekî te hebe ku tu girêdayî wan bî, an jî ew girêdayî te bin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.* | |
| Têkiliya bi kesî re | ☐ zarok (mezin)<br>☐ xwişk an bira<br>☐ dê an bav |
| **Ji kerema xwe hilbijêre:**<br>☐ Ev kes girêdayî alîkariya min e.<br>☐ Ez girêdayî alîkariya vî kesî me. | |
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Cureyê girêdana pêwendiyê (zêdetirî vebijarkek dikare bibe hilbijartin) | Sedemê ku ev kes girêdayî alîkariya te ye an çima tu girêdayî alîkariya vî kesî yî hilbijêre:<br>☐ dugyanî (hemîlbûn)<br>☐ lênihêrîna zarokekî nûbûyî<br>☐ nexweşiya derûnî ya giran<br>☐ nexweşiya fîzîkî ya giran<br>☐ kêmasiya giran a laşî (astengdarî)<br>☐ trawmaya psîkolojîk a giran<br>☐ pîrbûn (temenê mezin)<br>☐ yên din (ji kerema xwe diyar bike): |
| Cihê niha li welatên +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

| **Daxwaza ji bo yekbûnê** |
|---|
| Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?<br>☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.<br>**Di vê rewşê de, dê ji te û endamê malbata te were xwestin ku hûn razîbûna xwe ya fermî bi nivîskî bidin. Razîbûna fermî dê di formeke cuda de bê xwestin.**<br>☐ Na, ez naxwazim bibim yek.<br>Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin. |
| **Agahiyên têkildar li ser lawaziyên gengaz an sedemên mirovî** |
| Tu dikarî li vir her agahiyeke têkildar a ku ji bo rayedaran girîng e derbarê endamê malbata te de (her lawazî, hewcedariyên taybet an sedemên mirovî) binivîsî. |
| **Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?** |
| |
| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye? *Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.**<br>Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

## BEŞA 5. DARA MALBATÊ (BI DILXWAZÎ)

Tu dikarî dara malbata xwe di qutiya jêrîn de xêz bikî. Bawer be ku tu endamên malbata xwe yên nêzîk diyar dikî. Endamên malbata te yên nêzîk hevjîna te û zarok an zarokên te, dê û bavê te û xwişk û birayên te ne. Heke mimkun be, diyar bike ka endamê malbata te niha li kîjan welatî rûniştiye. Mînakeke dara malbata te di fîgura jêrîn de tê nîşandan.




***Agahiyên têkildarî her endamekî din ê malbatê di vê beşê de binivîse***